# Die Landesregierung Nordrhein-Westfalen

26/03/2021
Rüpela 1 jı 6an

Pressestelle Staatskanzlei
40213 Düsseldorf
presse@stk.nrw.de

Têl. 0211 837-1134
0211 837-1405
0211 837-1151

Ji bo welatîyan
têl: 0211 837-1001
nrwdirekt@nrw.de

www.land.nrw

## Danzanîna çapemenîyê - 25/03/2021

**Li ser pêvekirin û guherandinên di Qaydeyên Xweparastina ji Koronavayrûsê de kirî – Bakurê Ren/Vestfalyayê bi Firêna Rewşa Awarte stratejîyeke xurttir dixe rewacê**

## Laumann-ê wezîr: her çend tengên enfeksîyonê belawela bin jî em dikarin vayrûsê çêtir bikin mebest û pê re têbikoşin

## Birêvebirîya eyaletê herweha vê danzanîna jêrîn diyar kiriye:

Biryarên di encama şêwra birêvebirîyên federal û yên eyaletê de sitandî ji alî Bakurê Ren-Vestfalyayê ve tên xistin rewacê û li gora vê yekê di Qaydeyên Xweparastina Koronavayrûsê de guherîn tên kirin. Piştî 26ê adarê ji ber tenga 121,6 a bûyerên 7 rojan, Bakurê Ren-Vestfalyayê ji bilî van pêkanîna Firêna Rewşa Awarte tîne: Guherînên firehkir ên di tarîxa 8ê adara 2021î de hatî, dê li hemû herêmên ji 100 bûyeran buhurî û li bajarên li herêman nehatî dabeşkirin, dê bên betalkirin. Ancak, eyalet çapında 4800'ü aşkın test merkezi olması sebebiyle ve Kuzey Ren-Vestfalya'daki siviller için ücretsiz hızlı testlerin geniş tedarik yapısı sayesinde, etkilenen belediyeler bu rahatlatıcı uygulamaları tamamen iptal etmek yerine güncel negatif testlere sıkı şekilde bağlı olarak hizmetlerin sunulabilmesini sağlayabileceklerdir.

Dê qayde di tarîxa 29ê adara 2021î de bikeve rewacê û ta tarîxa 18ê nîsana 2021î bi awayekî demkî di rewacê de bimîne.

Ji ber tengên enfeksîyonê yên bêtir dibin, Firêna Rewşa Awarte ya Koronavayrûsê bi fermanên xwe yên qanûnî yên bi hûrgilî, bi awayekî bi Qaydeyan ve lihevhatî hatiye pêvekirin. Cihêtîyên herêmî, astên enfeksîyonê yên li bajar û herêman cûrên wê bêtir dibin derdixe pêş:

Eger li herêmekê yan bajarekî li herêman dabeşnekirî de tenga bûyerên 7 rojan li dû hev di seranserê sê rojên karkirinê de serê her 100 hezar kesî ji jimara 100 enfeksîyonên nû bibuhure dê Firêna Rewşa Awarte ya Koronavayrûsê bikeve rewacê. Di vê rewşê de dê belediye bi Wezîrîya Sihhetê re ji nêz ve kar bike û karibe ji du bijareyan yekî hilbijêre: rawestandina qaydeyên sivikkir ê di tarîxa 8ê adara 2021î de dayî û karantînayeke hişk, yan feydedîtina ji bijareya testê. Eger bijareya testê bê bijartin dê ev sivikkirin karibin dewam bikin, lê bi tenê ji bo mişterî, serdêr û bikarênerên encama testa wan a negatîv heye.

Wezîrê Sihetê Kar-Josef Laumann vê vedibêje: “Bi nûkirina van qaydeyan, Bakurê Ren-Vestfalyayê, tevlî keysên nû, dê êdî ji Firêna Rewşa Awarte ya Koronavayrûsê feyde bibîne. Versîyona Bakurê Ren-Vestfalyayê du feydeyên mezin didin: herêmên tesîrdîtî û bajarên li herêman dabeşnekirî dê karibin Firêna Rewşa Awarte bi kar bînin û dîsa ji jîyana tevahî re sînorkirinan pêk bînin. Lê bijareya testê ji bo girtina enfeksîyonên koronavayrûsê pêkhateyeke torê ye. Ev ê wê keysê bide me ku bibe teşwîqkirina testbûna nifûsê û bike em karibin mirovên asemptomatîk û vayrûs bi wan re tesbîtnebûyî ne zû fîltre bikin. Ji ber ku di her testeke bilez a pozîtîv de testa PCRê heye, bi vî awayî tengên enfeksîyonê ev çend cuda cuda dibin lê em ê karibin bi vayrûsê re bi awayekî mebest û bitesîr têbikoşin.”

Dê ev fermanên qanûnî ji bo bêhnvedana Paskalyayê jî di rewacê de bin. “Ez hîvî dikim her kes di bêhnvedana Paskalyayê de li malê bimîne, negere û li fermanên qanûnî yên AHA-yê pêk bîne. Her kesek ji têkoşîna bi vayrûsê re cuda cuda berpirsîyar e. Ji bilîvan, birêvebirîya federal daye zanîn ku dê bi miqdarên mezin aşî/qutan bê peyderkirin. Ji ber ku em ê bi rêya aşîkirinê gavên mezin biavêjin, ez bi hîvî me.”

## Ji tarîxa 29ê adara 2021î pê de kurtayîyeke kin a guherînên herî giring ên di Qaydeyên Xweparastina ji Koronavayrûsê de kirî ne:

| | **Tenga bûyerên 7 rojan <100** | **Tenga bûyerên 7 rojan >100, bêyî Bijareya testê** | **7 rojî >100, bi bijareya testê** |
|---|---|---|---|
| **Sînorkirinên bihevvebûnê** | Herî pir pênc kesên ji du malan hatî di cîhên tevahî de dikarin bên kêleka hev. | Ji maleke din herî pir bi kesekî re li cîhên tevahî dikare bê kêleka hev. Zarokên 14 salî û piçûktir tevlî vê jimarê nayên kirin. | Herî pir bi kesekî ji maleke din re li cîhên tevahî dikare bê kêleka hev. Zarokên 14 salî û piçûktir tevlî vê jimarê nayên kirin. |

| | | | |
|---|---|---|---|
| | Zarokên 14 salî û piçûktir tevlî vê jimarê nayên kirin. Bêyî nihêrtina li pergala jîyana wan, hevjîn ji yek malê tên hesabê. | Bêyî nihêrtina li pergala jîyana wan, hevjîn ji yek malê tên hesabê. Seranserê bêhnvedana Paskalyayê (1-5 nîsan) îstîsna: fermana qanûnî ya li ser vê jimarê tê beramberê 50-100 bûyeran, wek nimûne bi awayê ku herî pir pênc kes bin mirovên ji du malan hatî ne (zarokên heta 14 salan nayên jimartin). | Bêyî nihêrtina li pergala jîyana wan, hevjîn ji yek malê tên hesabê. Seranserê bêhnvedana Paskalyayê (1-5 nîsan) îstîsna: fermana qanûnî ya li ser vê jimarê tê beramberê 50-100 bûyeran, wek nimûne bi awayê ku herî pir pênc kes bin mirovên ji du malan hatî ne (zarokên heta 14 salan nayên jimartin). |
| **Pirtûkxane/ arşîv filan** | Bi şertê ku fermanên qanûnî yên paqijîyê û navberê hişk bên pêkanîn destûra bizavên wan tê dayîn. | Bizav, bi teslîmkirin, sitandin û lêvegerandina rewşên karin dîsa bên qezenckirin yan xwastî re sînorkirî ne. | Bi şertê ku fermanên qanûnî yên paqijîyê û navberê hişk bên pêkanîn destûra bizavên wan tê dayîn. **Dê bi tenê yên ji testa bilez encama negatîv bistînin bên qebûlkirin.** Test nikare ji 24 saetan kevntir be. |
| **Muzexane, pêşangeh, koşk, keleh, abîde û yên din** | Muzexane, pêşengehên hunerî, galerî, koşk, keleh, abîde û avahîyên wek wan bi dayîna randevûyê û pêkanîna keysa bidûketinê dikarin bibizivin. Kesên di heman demê de li cîhên girtî ne divên serî her 20 mîtroya çargoşeyî ji kesekî nebuhurin. | Bizivîna wan qedexe ye. | Muzexane, pêşengehên hunerî, galerî, koşk, keleh, abîde û avahîyên wek wan bi dayîna randevûyê û pêkanîna keysa bidûketinê dikarin bibizivin. Kesên di heman demê de li cîhên girtî ne divên serî her 20 mîtroya çargoşeyî ji kesekî nebuhurin. **Dê bi tenê yên ji testa bilez encama negatîv bistînin bên qebûlkirin.** Test nikare ji 24 saetan kevntir be. |

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Baxçeyên gîyaneweran/heywanan û parkên bejî yên qaydeyên wan ên ketinê hene** | Baxçeyên gîyaneweran bi dayîna randevûyê û pêkanîna keysa bidûketinê dikarin bibizivin. Kesên di heman demê de li cîhên girtî ne divên serî her 20 mîtroya çargoşeyî ji kesekî nebuhurin. Li cîhê derve pêdivêya mirovên serê her mîtroyeke çargoşeyî tune ye. | Serdêr nikarin xwe bigihînin cîhên nîşandan û pêşandana hundirî. | Baxçeyên gîyaneweran bi dayîna randevûyê û pêkanîna keysa bidûketinê dikarin bibizivin. Kesên di heman demê de li cîhên girtî ne divên serî her 20 mîtroya çargoşeyî ji kesekî nebuhurin. **Dê bi tenê yên ji testa bilez encama negatîv bistînin bên qebûlkirin.** Test nikare ji 24 saetan kevntir be. |
| **Avahîyên bazirganîyê yên berhemên krîtîk nafiroşin** | Di avahîyên parekendeyê yên berhemên krîtîk nafiroşin de (beqqalîye, alavên kîmyayê, mexazeya çîçekê filan) destûr heye bi randevûyê tiştin bên kirîn (di heman demê de jimara mişterîyên di milkî de heyî serê her 40 mîtroyeke çargoşeyî divê bi yek kesî sînorkirî be). Divê randevû bê sitandin û dema serdanê bê kinkirin. | Bizava karsazîyên bê îmtîyaz hatine qedexekirin. | Di avahîyên parekendeyê yên berhemên krîtîk nafiroşin de (beqqalîye, alavên kîmyayê, mexazeya çîçekê filan) destûr heye bi randevûyê tiştin bên kirîn (di heman demê de jimara mişterîyên di milkî de heyî serê her 40 mîtroyeke çargoşeyî divê bi yek kesî sînorkirî be). Divê randevû bê sitandin û dema serdanê bê kinkirin. **Dê bi tenê yên ji testa bilez encama negatîv bistînin bên qebûlkirin.** Test nikare ji 24 saetan kevntir be. |

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Xizmetên ji wan re pêvebûna nêzîk divên** | Xizmetên di wan de ne mumkin e navbera 1,5 mîtroyî ya herî kêm pêk bên û bihevvebûna nêzîk ji wan re divê, bi tenê bi şertê ku pêdivêyên paqijîyê yên di qaydeyan de xuyandî pêk bên destûr ji wan re heye. Eger mişterî wek xizmetên xweçêkirinê yên li ser rûyî pêk tên gava xizmetê nikaribe maske li xwe bike, divê encameke mişterîyî ya testeke negatîv a wê rojê hebe û rêncber jî bi pîr û pergal bên testkirin. | Ji xizmetên ku di nava mişterîyî de navbera herî kêm a 1,5 mîtroyî nikare pêk bê, û bihevvebûna nêz ji wan re divê, destûr ji wan re nayê dayîn. Xizmetên ji alî tibbî ve divên, xizmetên berberîyê, xizmetên pêyan ên ne tibbî û bi mebesta karî veguhestina kesan di nava vê de nîne. | Xizmetên di wan de ne mumkin e navbera 1,5 mîtroyî ya herî kêm pêk bên û bihevvebûna nêzîk ji wan re divê, bi tenê bi şertê ku pêdivêyên paqijîyê yên di qaydeyan de xuyandî pêk bên destûr ji wan re heye. **Dê bi tenê yên ji testa bilez encama negatîv bistînin bên qebûlkirin.** Test nikare ji 24 saetan kevntir be. |

**Gava tengên bûyeran ji rê derkevin fermanên din ên qanûnî**

Tevlî "tevdîrên Firêna Rewşa Awarte" ya di seranserê eyaletê de; li dû hev di seranserê 7 rojan de serê her 100.000 kesî gihîşt bêtirî 100 kesên nû yên bi enfeksîyonê ketî û bajarên li herêman dabeşnekirî û herêmên bêtirî navînîya eyaletê bi pergal nîşan didin (Landeszentrum Gesundheit her roj tê belavkirin) yan jî nexasim li cîhên ku li wan rewşeke enfektîyologîk a din a giringîya wê krîtîk be heyî, bi sebebên taybet, ji bilî yên di van Qaydeyan de xuyandî, dê bê nirxandin ka tevdîrên bêtir ên parêzkar divên yan navên. Ev dê bi hevkarîya Wezîrîya Sihhetê, Karkirinê û Karûbarên Civatî karibin bên birêxistin.

Herêm û bajarên li herêman dabeşnekirî yên di seranserê 7 rojan de jimara bûyeran bi rêkûpêk û ciddî, serê 100 hezar kesî ji 50yî kêmtir bûne (Landeszentrum Gesundheit her roj tê belavkirin); dê karibin bi hevkarîya bi Wezîrîya Karkirinê, Sihhetê û Karûbarên Civatî, dê karibin biryar bidin ka çi tevdîrên parêzkar dikarin bên sivikkirin.

Guherandinên din ên di Qaydeyên Xweparastina ji Koronavayrûsê de:

- Bi komên herî pir ji pênc zarokan pêkhatî re dibe hewzên soberîyê ji bo dersên melevanîyê yên asta destpêkê bên vekirin.
- Palpişt bi qanûnê mijareyê heyî yê Hambûrgê û bi awayê ku fermanên qanûnî yên paqijîyê yên Qaydeyan pêk bên, eywanên esmerbûnê dikarin bên vekirin, ji ber ku di van avahîyan de pêvebûna kesîn navê.

Fermanên qanûnî yên têkildar di vê navnîşanê de tên belavkirin: www.land.nrw.

***Jo bo welatîyên çi pirsên wan hebin jimara têlefonê: 0211 8555.***

***Ji kerema xwe pirsên xwe yên li ser bultena çapemenîyê ji nivîsîngeha çapemenîyê ya Wezîrîya Karkirinê, Sihhetê û Karûbarên Civatî re bişînin - têlefon: 0211 855-3118.***

***Yek dikare xwe ji vê vê navnîşanê jî bigihîne vê bultena çapemenîyê:***

***www.land.nrw***

***Siyaseta veşarîbûnê ya çapemenîya civatî***